

## «Êrîşa ser Herêma Kurdistanê binpêkirineke eşkere ye ji yasaya navdewletî re»



Kurdistanê binpêkirineke eşkere ye ji yasaya navdewletî re, û pêwîstî bi şermazkirineke navdewletiya berfireh, herwiha pêwîstî bi rûniştineke Neteweyên Yekgirtî heye bi mebesta eşkerekirina tawanên vê rejîmê. Hevdem, êrîşa Îranê bi rêya topxane û mûşekan zêdegavî ye li ser serweriya Îraqê, û pêwîste Hikûmeta Îraqê hewlên xwe yê dîplomasi bike ji bo bidestxistina piştevaniyeke navdewletî bi mebesta rawestandina van kiryarên berdewam”.

### Kurdistan

Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S, beyanameya şermazkirina êrîşên Îranê ser serweriya Herêma Kurdistanê belav kir û tede ragihand “Baregeha

Partiya Demokrata Kurdistana Îranê ji aliyê Pasdarên Îranê ve bi mûşek û firokeyên bê firokvan di nava xaka Herêma Kurdistanê de rastî êrîşan hat, hevdem baregeha Partiya “Komele” li gundê Zirgiwêz li

Silêmaniyê, û baregeha Partiya Azadiya Kurdistanê li devera Şêrawa li Pirdê hatin armanckirin, û di encama van êrîşan de derdora 50 kes şehîd û birîndar bûn. Em wek Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya van êrîşên

berdewam li ser baregehên partiyên Kurdî di nava xaka Herêma Kurdistanê de ji aliyê Hikûmeta Tehranê ya ku terora sistematîk li hundir û derveyî Îranê birêve dibe, şermazar dikin. Ev êrîşa têkder li ser xaka Herêma

## Xwepêşandana daxwaza mafê perwerdeyê rastî êrîşê hat

### Bidûvcûn

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS ragihand, ji bo redkirina biryara girtina dibistan û peymangehên taybet, bi sedan kes bi çalakiyekê de ew biryar red kirin, lê hêzên ser bi PYDê ew çalakî bi darê zorê belav kir û hejmarek

çalakvan revandin. Sekretariya Giştî ya ENKSê di daxuyaniyekê de ragihand, “Li ser banga rêxistinên civaka sivîl roja Çarşemê 28ê Îlona 2022an bi sedan xelk û xwendekar ji bo redkirina biryara PYDê ya girtina dibistan û peymangehê taybet, li pêş avahiya Netewên Yekgirtî li Qamişlo dest

bi xwepêşandekê aştiyane kir.” ENKSê diyar kir, “Çekdarên PYDê hewl dan bi zorê vê çalakiyê belav bikin û bi otomobîlan ketin nav çalakiyê û hejmarek ji çalakvanan girtin û dest danîn ser mobîlên wan û nehiştin dîmenên çalakiyê bigirin.” Her got: “Encûmena Niştimanî ya Kurdî ku



piştevaniya bangewaziya xelkê dike, biryara girtina wan peymangeh û dibistanan dubare dike û kiryarên çekdarên ku êrîşî xwepêşandanê

kirine şermazar dike û daxwaza berdana kesên hatine revandin û vegerandina tiştên ku ji welatiyan dizîne dike.”

Referandum belgeyek di destê Kurdan de ye - Rûpel-2

Cemîl Horo yek ji stûnên hunera Kurdî - Rûpel-4

## Referandum belgeyek di destê Kurdan de ye

### Kurdistan

Serok Mesûd Barzanî, 25ê Îlona 2022an di salvegera pêncemîn a encamdana referanduma serxwebûnê perçeyek ji helbesteke Erebi ya helbestvanê Tunisi Ebû Qasim E-Şabi li hejmara xwe tora civakî "Twitter" parve kir:

"Eger miletek rojekê jiyanê bixwaze Bêguman çarenivîs dê bersivê bide Bêguman tariya şevê dê biçe Bêguman zincîr jî dê bişike Kî nexwaze hilkişe çiyayan Dê her tim di nava çalan de bijî"

Ev helbesta Ebû Qasim El-Şabi di Îlona sala 1933an de hatiye nivîsandin û yek ji helbestên herî bi navûdeng a di helbesta nûjen a Erebi de ye. Malikên destpêkê yê ve helbestê jî cihl xwe di sirûde netewî ya Tunisi de girtine. Di salvegera pêncemîn a referanduma serxwebûna Kurdistanê de, 25ê Îlona 2022an de, bi amadebûna Serok Barzanî, Pêncemîn Festîvala Rewşenbîrî ya Duhokê dest bi karên xwe kir û Serok Barzanî gotarek tê de pêşkêş kir. Serok Barzanî di gotara xwe de got, Dîroka gelê me tejiye ji serbilindî û serfiraziyê, di heman demê de dîrokekî teji li êş û azaran. Berî naha ew şer li gel gelê me dihate kirin aşkera bû, balefir, tank û top û artêş dişandin ser Kurdistanê. Pêşmergeyên qehreman bi piştvanîya gelê me ye berxwedêr ve serkeftinên mezin bidest anîn. Îro ew şer

bi awayekî din berdewam dike. Barê giran li ser milê we ye gelê nivîskar û rewşenbîran. Ew dixwazin wê îradeyê bişkînin ku Pêşmerge bi çifteyêkî şerê balefirê dikir. Herwaha diyar kir: Êrîşa herî metirsîdar ew e ku îro li ser me tê kirin û dixwazin îradeya me bişkînin û çanda me têk bidin û bawerîya me ya bi me heyî nehêlin. Dema kurdan bawerîya xwe bi xwe nema û xwe li hember xelkê din kêmtir zanî, ew mirin e. Heman demê de nabe em çanda pêkvejiyan û rêz li hev girtin û yek qebûl kirine ti demekî ji bîr nekin. Ji ber ew yek ji serwet û dewlemendiya herî bi nirx e û gelek nirx ji ber wê jî ji derve ve gelê me re hatiye dayîn. Ne xwe ji kesê mezintir bibinin, ne jî xwe ji kesekî biçûktir bibinin û em ji ti kesê ne kêmtir in. Serok Barzanî ragehand: Ew êrîş berdewam in û gelek mixabin di navxweyî de jî hin kes rê ji wê re vedikin. Ji ber wê jî çawa Pêşmerge şerê dijminê gelê kurd dikir û naçar kir li hebûna gelê kurd binasin û mukir li mafên gelê Kurd bînin, îro meydana şer di stûyê we de ye. Ez di wê baweriyê de me ku serkeftina mezin hûn dê bidest bixin û planên nehez û dijminan pûç bikin. Ji ber bi rastî gelek nexwase ku em dibinin hin kesên xwe rewşenbîr dizanin rê ji dijmin re vedikin, ku ew bîr çand, dîrok, xebata Pêşmerge û xwîna şehîdan hemûyê wînda bikin û erzan bikin. Herwaha got: Tîka dikim gelê rewşenbîr û nivîskaran,



vê meydanê ji bo xwefiroş û dijmin û nehezan vala nekin. Derbarê salvegera encamdana referanduma Herêma Kurdistanê de, Serok Barzanî di vê roja pîroz de, tenê dikarim bibêjim, dest û çavê kesên ku xwe neçemandine û xwe naçemînin maç dikin. Her wiha got: "Miletê me gelek xwîn û qurbanî dane. Şehîdên me û xwîna wan li cem gelekî bi qedr e, nabe em rê bidin dijim û nehezên me dilê xwe bi şikandina îradeya gelê Kurdistanê xweş bikin."

**Referandoma serxwebûna Herêma Kurdistanê**  
Roja 7ê Hezîrana 2017an, nûnerên partiyên siyasî yê di nava Parlamentoya Kurdistanê de û bi amadebûna Serok Barzanî, Cîgirê Serokê Herêma Kurdistanê, Serokwezîr û Serokê Komisyona Bilind a Hilbijartinên Kurdistanê, biryara encamdana referandumê hate dayîn û Encûmena Bilind a Referandumê hat pêkanîn û her yek ji nûnerên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK), Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK), Yekgirtûya Îslamî, Tevgera Îslamî, Partiya

Zehmetkêşan, Hizba Şiyoi û Partiya Sosyalist di wê encûmenê de beşdar bûn. Her di wê civînê de, roja 25ê Îlona 2017an wek roja encamdana referandumê li Herêma Kurdistanê û navçeyên Kurdistanî yê li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê hat diyarkirin û tevahiya partî û aliyên siyasî razemendiya xwe li ser encamdana referandumê nîşan dan.

“  
**Referandum ji bo perçeyên din jî baş bû**

10 rojan berî encamdana referandumê û di 15ê Îlona 2017an de, Parlamentoya Kurdistanê bi piraniya dangan birêveçûna referandumê pesend kir, Komisyona Bilind a Rapirsî û Hilbijartinan serperîştîya birêveçûna referanduma serxwebûnê kir. Biryara encamdana referandumê, qonaxeke din a giring a xebat û qurbanîdana gelê Kurdistanê bû, bi taybet ku tevahiya aliyan piştgiriya temam lê kirin û soz dan ku bi hemû karînen xwe kar

ji bo serxistina proseya referandumê bikin. Giringiya zêdetir a biryara encamdana referandumê di wê derket ku ne tenê li Herêma Kurdistanê, lê belê li navçeyên Kurdistanî yê li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê bê kirin. Ev referandum jî bi piştbestina bi binemayên mafê çarenivîsî ya gelan e ku mafekî rewa ye û ji aliyê Komeleya Giştî ya Netewên Yekgirtî ve hatiye naskirin û Herêma Kurdistanê jî hemû taybetmendiyên wê yê wek xak, ziman, kultur û dîrok hene ku biryarê li ser çarenivîs û pêşeroja xwe bide. Roja 25ê Îlona 2017an bi rêberîya Serok Barzanî, gelê Kurdistanê referanduma serxwebûnê encam da û %93 dengê "Belê" dan, her çiqas bûyerên piştî referandumê, serxwebûna gelê Kurdistanê paş xist jî, lê ev daxwaz heta niha di dil û derûna hemû Kurdan de zindî ye.

“  
**Pêwîste sût ji encama referandumê bê wergirtin**

## Referanduma xweneçemandinê



Şexo Efrînî

25ê meha Îlûna sala 2017an, gelê kurd biryareke dîrokî bi cî kir, bûyera herî giring di dîroka gelê kurd de ye, biryar û fermana serok Mesûd Barzanî di encamdana rêfrandoma serxwebûna Kurdistanê ye. Ne bi tenê bûyerek bû û çû na, lê belê belgeyeke bo neviyên neviyan, ta bidestxistina mafên rewa, gelê kurd dê wê belgeyê di çavên dagîrkerên Kurdistanê de derxînin û bi kar bînin. Serokê Herêma Kurdistanê di wê dema de serokê gelê kurd Mesûd Barzanî, di Hizêranê de li gel nûnerên hemû partiyên civiya, bi hev re bi yek dengî gotin: Belê bo encamdana giştîpirsiya serxwebûna Kurdistanê, ku ji dehe salan ve aliyên Îraqî

nedipejirandin ku bibin hevpar û hevalbend, lê belê herdem kurd weke dujmin ditîtin. Li ser fermana serokê Kurdistanê, gelê kurd ji Xaneqînê ta bi Zaxoka delal bi milyonan ew biryar bi dilekî fereh wergirtin, û serokê hêja bi tenê nehiştin. Bêguman hersê perçeyên din nexasim kurdên Rojavayê Kurdistanê û revenda kurdî li Ewropayê kêmasî nekirin, bi vîn û viyana xwe beşdarî di piştevaniya biryarê de kir. Em dikarin bibêjin ku rêfrandoma serxwebûna Kurdistanê piroseya herî serkeftî li ser asta cîhanê bû, ji ber ku rêjeya beşdarbûyan 4 milyon kes derbas kir, ji wan kesan 92,7 li ser sedî gotin belê bo giştîpirsiya serxwebûna Kurdistanê, belê bo Kurdistaneke azad, serbest û serbixwe. **Gelo divê Kurd**

**poşman bibin?** Piştî ku kurdan pirose encam da, û encamên rêfrandomê derketin, çavê dujminan bar nebûn, dîsa êrîşî qewareya Kurdistanê kir, ji ber xiyaneza 16 Cotmehê, kurdan, Kerkûka dilê Kurdistanê û deverên din derdan û ji dest dan, ta roja îro jî em baca wê xiyaneza ku ji beşekê ji partiya Yekîtiya Niştîmaniya Kurdistanê YNKê di dermafê doza kurdî de kirine, didin. Endezyarê serxwebûna Kurdistanê serok Mesûd Barzanî, di pirtûka xwe Bo Dîrok û lêdwanên xwe de tekez kiriye, ku ew li ser wê biryarê nepaşîman e, eger giştîpirsiyeke din hebe ew ê yeke nû li ser gelê bike ka gel pašîman in ya na. Rojdbûna serok li ser encamdan wê rêfrandomê, careke din piştrast ku neçemandin para kurdan e, di salvegera

5 ya rêfrandoma serxwebûna Kurdistanê de, serok Mesûd Barzanî careke din gelê kurd han da, ku çiya li benda me ne, em xwe neçemîn û em ê xwe neçemîn, careke din tekez kir ku kurê ceneral Barzaniyê nemir e, neviyên Şêx Ehemd û Şêx Ebdulsalam e, weke çawa bav û bapîrên wî serê xwe ji dagîrkerên Osmanîyan, Sefewîyan, Birîtanîyan, û deshelatdarên Îraqê re nedanî, serok jî ew rê jî xwe re hilbijartîye, rêya neçemandinê, rêya azadiya Kurdistanê, rêya serbestî û serfiraziyê, rêya aştxwaziya gelan, rêya biratiya ol û pêkhatayan, rêya serxwebûna Kurdistanê. Serokê gelê kurd di salvegera 5an ya giştîpirsiya serxwebûna Kurdistanê de hin helbest ji helbestvanê

ereb yê Tonisî Ebû Qasim Elşabî anî û got: Eger gel jiyane bixwazê, rojêke were qeder dê bersivê bide. Dîsa jî piştast kir ku: Rojêke dîrokî ye, min çî axaftineke din nîn e îro ji we re bibêjim ji bilî wê yekê dibêjim dest û çavê wan maç dikim ku xwe neçemandin û xwe naçemîn, mîletê me qurbaniyeke zêde daye, me xwîneke zêde daye, şehîdê me gelek biqeder in, xwîna wan gelek biqeder e, nabê em rê bidin dujmin û nehezên me dilê xwe bi wê yekê xweş bikin îro bibêjin "Me viyana we şikand" ji ber ku eger viyana me şikiya, me hîç qedir û buhayek namîne û ew destkeftên hene jî ew jî ji dest diçin. Dewltbûn û serxwebûna mafekî rewa yê gelê kurd e, madam hilgirê wê pirojeyê hene, rojêke were em ê bi wê yekê şa bibin.

## Revandina zarokan ji bo leşkeriyê berdewam e

### Bidûvçûn

Rêxistina Ciwanên Şoreşger a ser bi PYD ve ciwaneke dina 15 salî ji taxa Şêx Meqsûd a Helebê revand û bir navendeke leşkerî. Keça 15 salî Bêrîvan Ebdulhemîd Mihemed roja 21/7/2022 li taxa Şêx Meqsûd a Helebê ji aliyê Tevegira Ciwanên Şoreşger ve hatiye revandin û ji bo navendeke leşkerî hatiye birin. Bêrîvan Ebdulhemîd Mihemed ji dayikbûna 2007an e, gundê



Sariya yê navçeya Mabeta ya Efrînê ye û bi malbata xwe re koçberî taxa Şêx Meqsûd ya Helebê bûye û li pêşiya kargeheke dirûtîne ya

li kolana Rojhilat a Şêx Meqsûd hatiye revandin. Taxên Eşrefiyê û Şêx Meqsûd ên Helebê, wek taxa Kurdan tê nasîn ku nêzîkî 200

hezar Kurd û bi taybet ên Efrînê lê dijîn, di destê çekdarên PYD de. Piştî dagîrkirina Efrînê ji aliyê artêşa Tirkîyê û grûpên çekdar ên ser bi wê ve, hejmarek mezin ji Kurdên Efrînê koçberî wan her du taxan bûne. Tevî ku HSDê di Hezîrana 2019an de bi Netewên Yekbûyî re planek ji bo bidawîkirin û qedexekirina tevîkirina zarokan di nava çekaran de îmze kiribû. Lê ji dema ku peyman hatiye

îmzekirin ve, rewşa revandina zarokan bi dawî nebûye. Malbatên zarokên revandî jî kiryarên Tevegira Ciwanên Şoreşger şermezar dikin û bang li rêxistinên ku girîngiyê didin mafên zarokan, rêxistinên navdewletî û aliyên pêwendîdar dikin ku fişarê li Rêveberiya Xweser û Hêzên Sûriyeya Demokrat (HSD) bikin ta ku çarenivîsa zarokên wan, diyar bikin.

## Cemîl Horo yek ji stûnên hunera Kurdî



### Kurdistan

Hunermendê navdar Cemîl Reşîd Horo sala 1934an li gundê Serîncekê yê ser bi navçeya Bilbilê ya Efrîna Kurdistanê Sûriyê jidayik bûye. Ji biçûkaniya xwe de mereqa wî ser strana û kelaman hebû, hêdî hêdî ew mereq pêre mezin bû, û bû wek stûnek ji stûnên hunermendên Çiyayê Kurmênc, herwiha li ser asta çar parçeyên Kurdistanê dengê wî yê çiyayî belav bû. Cemîl Horo sê caran jiyana hevjinîyê pêk aniye û ji ber berpirsiyaretiya malbatî neçar bû karekî din di ber karê xwe yê hunerî re bike û tevî rewşa wî ya tendirustî karê dartiraşiyê dikir û piştî kaftîriyek li taxa Şêx Meqsûda Helebê bi navê Qehweya Cemîl Horo vekir û weke roja îro ew qehwe li Şêx Meqsûd navdar e.

Hunermend Cemîl Horo rastî gelek astengiyên di jiyana xwe de hatiye nexasim sala 1973an sala terorkirina kurê wî yê bi navê Henan ê 3 salî ku tê gumankirin ku

bi destê Partiya Şiyû, li Efrînê hatibe pêkanîn û gelek bandora nerînî li ser wî kir .



**Cemîl Horo  
kesayetiyeke  
netewperwer**

Hunermendê mezin yek ji endamê Partiya Demokrata Kurdîtan Sûriya bû û di nav partî de karê xwe yê siyasî berdewam dikir û ji ber wê yekê gelek caran rastî girtin û lêdanê hat, û di dema deshelatariya Hikûmeta Sûriyê û Misrê 1958an de sizeya 80ê rojî di zindanê de derbas kir bi tenê ji ber ku agirê Newrozê li ser çiyayê Efrînê bi sê hevalên xwe re hilkirin û dadan.

Û piştî ji zindanê derket, yekser ji bo nexweşxaneyê Elrazî ya Helebê hate veguhestin lê piştî ku pizîşkên nexweşxaneyê zanîn ku Kurde ew derman nekirin û li mala pizîşkekî Kurd hate çareserkirin. Ji ber astengiyên berdewam

neçar bû berê xwe bide derveyî Efrînê û li Tirkîyê demekê jiyana derbas kir û piştî berê xwe da Herêma Kurdistanê û li bajarê Zaxo bi cî bû, û demeke baş li cem Pêşmerge Îsa Siwar ma.

Û li wê derê hestên wî yên netewî û hezîr û raman li ser rêbaza Barzaniyê nemir bi hêz û zêde û mezin bû, û bi taybet piştî ku nemir Mela Mustefa Barzanî li sala 1958an vegehiya Kurdistanê. Sala 1970î de rêkefta aşîtiyî di navbera Kurdan û hikûmeta Îraqê de çê bû, careke din vegehiya Kurdistanê Sûriyê û kar û xebata xwe ya hunerî berdewam kir.



**Cemîl Horo  
hunermendekî  
Kurdistanî bû**


Despêka jiyana wî ya hunerî bi beşdarbûna li aheng û boneyan dest pê kir û di sala 1965an de yekem kasêta xwe tomar kir û gelek stran tede gotin wek Memê Alan , Eyşa Îbê , Cebelî, Lo

Bavo, Xemê Zalim. Herwiha gelek stran di dema li turkiyê bi hunermenda Kurd ya Bakûrê Kurdistanê Eyşe Şan re tomar kirin û Sazvanê navdar Arif sax ji wan re lê dide û ji stranên li turkiyê hatine tomar kirin wek Bedew Salih beg Teyar Axa. Û li qonaxa siyem gelek stranên netewî gotin û bi taybet li ser serok û serkirdeyên Şoreşa Kurdî mîna Barzaniyê nemir, Leyla Qasim , Şêx Seîd , Keça Kurdan Newroz, Pêşmergeyê Kurd û çend stranên din yê netewî û şoreşgerî. Cemîl Horo di gelek festîval û ahengên Newrozê de beşdar bûye ku di sala 1972an ahinga newrozê li gel Arif Cezîrî û Seîd Yûsif li sînameya Rêvûlî li Lubnanê beşdar bû.

Herwiha li Newrozeke Qamişlo li gel tîma xwe ya dîlanê tîma Efrînê beşdar bû û stran bi Mehmûd Ezîz û Seîd Yûsif re gotin û Newroz xemilandin.

Hunermendê welatparêz stranên xwe yên kiltorî û yên netewî nivîsgeha sitranên Kurdî dewlemend û zêde kir û niha weke sunbilê Kurdistan Sûriyê di sitranên kiltorî û netewî û vejandina wê de tê naskirin. Di 19/9/1989an di nexweşxaneyê Ibin Elreşîd koça xwe ya dawî kir û di 20/9an li mezara Henan li Efrînê li cem nemir Nûrî Dêrsimî di xak hat spartin .

## Serxwebûn



Babîsok Amûdê

Bi coşîn û bi dilşadî Mizgînî biden dîrokê Ji Barzanî re û Qadî Bighînî wan naverokê Serxwebûna me va pêkhat Bi wan dest ên qehremana Rizgarbûn zemîn û kelat Standin tola Pakrewana Rûyê Welat girnejîn bû Şîn û xemgîn î rawestiya Bi millet tevde , şêrîn bû Buhişta hor û periya

Ji wê dema Sayks Pîko Em mabûn bin dest bi zorê Felat bi dest ket î îro Al xuya dikî li jorê

Çi rind û xweş e ,Serxwebûn Pîroz bikin bi silavan Deng giha cîhan û gerdûn Pişt tewandin ta hunavan

Azad bijîn Kurên Rustem Tevde bikin dîlan û çep Nema kolet î û setem Şikestin qeyd û penc û lep

Silav li te Serok Mes'ûd Omîda me te pêk anîn Resemte llene ell hidûd Bi dil pak û bi mêran î

Qend ji lêvên xwe hilwişand Babîsoko di vê ristê Teht pijirand , agir vejand Bi tîpan û bi helbestê